Tu ji bilî stiran gotinê, hunerekê dî jî dizanî?

Belê, ez hindek amîrên muzîkî dijenim, û bi karê dublajê jî dikem. Her ji ber vê çendê ez yê hatîme wergirtin wek karmend li pişka dublajê li têlevzyona (Kurdistan/dhok). Dîsan ez peyv û awazan dadinim bo zarok û mezinan.

Êkem karê te yê hunerî çi bû?

Êkem karê min yê hunerî stiran gotin bû, ku ew jî di rêya pişkdarbûn di ahengên qutabxanan da, ez ber bi stiran gotinê ve çûm.

Tu hez ji dengê kîj hunermendan dikey?

Ez hez ji dengê hemî hunermendên zarok û mezin dikem, bi taybetî (Mihemed Arif Cizîrî).

Lawînîya te çi guhorrîn li dengê te yê nazik nekirî ye?

Bi kenîve: Belê eve tiştekê siruştî ye, lê xizmeta min her ya berdewame.

Xoştirîn tişt li def te çî ye?

Hevalînî, min gelek gelek heval hene.

Tu kovara sivore çewa dibînî?

Kovareka Hemereng û bi mifaye, û bi dîtina min hemî zarok hez jê diken; çunkî êkemîn kovare li bajêrê Dihokê zarok fêrî rewşenbîrîyiç kirîn.

Dumahîk peyva te?

Demê zarok stiranên min dibêjin, hest bi dilxoşyê dikem û hest pê dikem ku ez yê şîyayim pîçekê . xizmeta wan bikem